



Heyva sor a Kurdistanê

BROŞÛR No 5

Ji bîr nekin, dema mirov destê alîkariyê li ser hev qut bikin, wê demê mirovahî jî bi temamî diqede.



Vergiss nicht. An dem Tag wo die Menschheit aufhört sich gegenseitig zu helfen, ist sie verloren.

Kurdî

Ji bîr nekin, dema mirov destê alîkariyê li ser hev qut bikin, wê demê mirovahî jî bi temamî diqede.



Salên 90'î ji ber dijiwariya şerê li Bakurê Kurdistanê û valakirina bi hezaran gundan ji aliyê artêşa Tirk ve, bi sed hezaran Kurd ji cih û warên xwe dûr ketin û bûn mexdûrê şer. Ji bo alîkariya Kurdên li ser axa xwe dimînin û yên bûne mexdûrên şer, Heyva Sor a Kurdistanê li ser hîmê xwedîderketina li kesên xizan û muhtac sala 1993'an hat avakirin. Ji wê rojê ve beyî cudaî û di bin her şert û mercê de hewl da êşa mirovan kêmkir. Yekane armanca Heyva Sor a Kurdistanê parastina tendirustîya mirovan û rêzgirtina ji kesayeta wan re bû. Her demê piştgirî da dostanî û biratiya di navbera gelan de. Bi ti awayî guh neda cudahiya netew, ola, siyaseta û ramanên mirovan. Ji ber ku Heyva Sor a Kurdistanê saziyeke alîkariyê ya dildariyê ye, ti carî ji bo berjewendiyên xwe tevnegeriya.

Heyva Sor a Kurdistanê li gorî pîvanên Navneteweyî yên Saziyên Alîkariyê tev digere û li gorî van pîvanan xebatên xwe birêve dibe.



Li Rojhilata Navîn şerê ku niha tê meşandin rê li ber trajediyêke mezin ya mirovahiyê vekiriye.

Ji ber vî şerî ne tenê Rojhilata Navîn, bandora xwe li gelek aliyên cîhanê kir.. Tenê ji ber şer û aloziya li Sûrî ku 4 sal li pey xwe hiştin, heta niha nêzî 300 hezar kesî jiyana xwe ji dest daye, bi sed hezaran kes birîndar bûn û zêdeyî 6 mîlyon kesî cih û warên xwe berdaye û bûye rêya koçberiya ber mirinê ve. Ji ber vê çendê beşek mezin ji van mirovên koçber bûne, hê jî nebûne xwedî cihe û warên ku karibin xwe pareyek nan lê bixwin. Gelek ji wan bi hêviya ku bibin xwediyê jiyaneke aram, li ser rêyên koçberiyê şerpeze û perîşan dibin. Bi hezaran ji wan li ser rêyên koçberiyê, li şûna jiyaneke rastî mirinê tên. Ji xwe karwanên koçberên ku di Derya Sipî û li ser rêyên Ewropayê jiyana xwe ji dest didin, vê rastiyeke radixe ber çavan. Ya herî xerab jî ew e ku mirov tevî vê rastiyeke hê jî berê xwe didin welatên koçberiyê.

Li hemberî vê trajediyê erka herî bingeîn ya sazî û dezgehên mirovî ew e ku karibin pêşî li pêla koçberiyê bigrin û pêdiviyên wan kesên muhtac bicih bînin. Heta niha saziyên ku di bin navê alîkariyên mirovahî de heta kîjan radeyê ev erka xwe bicih anîne, ev yek mijara lêpirsînê ye..

Saziya Alîkariya Mirovahî Heyva Sor a Kurdistanê, ji roja hatiye damezrandin ango ji sala 1993 an ve, tevî hemû asteng û derfetên kêr jî, beyî ku cûdahiyê bixe nava mirovan, her tim hewl daye destê alîkari dirêjî kesên muhtac bike.

Heyva Sor a Kurdistanê, bi taybet ji sala 2012'an, ango bi zêdebûna aloziya li Sûrî ku ji nêz ve bandora xwe li gelê Rojava kir, hemû derfetên xwe ji bo Rojava û Kurdên Sûrî bikar anî..

Piştî hewldana qirkirina li Şengalê jî, Heyva Sor a Kurdistanê erka xwedîderketina li Kurdên Êzdî, weke berpirsiyariyeke exlaqî û mirovahî dît û gelek caran alîkariyên xwe gihandina Çiyayê Şengalê..

Sala 2015'an jî, Heyva Sor a Kurdistanê li ser bingeha projeyên hevpar bi saziyên Kurd ên alîkariyê li Franse, Swîsre, Holanda, Belçîka, Awusturya, Danîmarka, Brîtanya, Norwêc, Swêd û Îtalya re, bû hêviya bi sed hezaran kesên li Rojava û Şengalê. Heyva Sor bi van xebatên xwe karîbû heta radeyeke pêşî li pêla koçberiyê bigre.

Eger îro bêtirî 250 hezar kes vergeriya Kobanê û her weha li gelek deverên Rojava xebatên alîkariyê tînin birêvebirin, bandora Heyva Sor a Kurdistanê zêde ye..

Kêr be jî, di encama xebatên Heyva Sor a Kurdistanê de îro li Çiyayê Şengalê tevî zor û zehmetiyan jî bi hezaran Kurdên Êzdî hene..



Heyva Sor a Kurdistanê sala 2015'an ji bo kesên xizan û hewcedar gelek projeyên alîkariyê birêve birin.

Destpêka sala 2015'an û bi taybet piştî ku bajarê Kobanê ji dagirkeriya rêxistina Daiş'ê rizgar bû, saziya Heyva Sor a Kurdistanê ji bo bi cihanîna pêwîstiyên tendirustiyê, bi buhayê **148.700 Euro**, 5 Ambulans û 2 Nexweşxaneyên Gerok şandina Koban û Şengalê.



Ji bo zarokên Kobanî yê bi nexweşiya Çolyakê ketine, alîkarî hat şandin.

Li Kobanê ji ber hesasiyeta li hemberî madeya glûten ya di genim û ceh de ye, bi sedan zarok bi nexweşiya Çolyakê ketin. Heyva Sor a Kurdistanê bi buhayê **5.500 Euro** xwarine bêglûten ji van zarokan re şand.



Li hemberî şert û mercên zivistanê yê zor û zehmet, Heyva Sor a Kurdistanê ji bo Kurdên Êzdî yê li Çiyayê Şengalê 300 konên malbatî û bi hezaran betaniye şandin.



Li bajarê Dêrikê yê Rojavayê Kurdistanê bi desteka **Heyva Sor a Kurdistanê** Navenda Tendirustiyê ya bi navê **Heyva Sor a Kurd** hat vekirin.



Li Koban û Şengalê, ji bo sedan kesên ku di encama êrîşên rêxistina Daişê de birîndar bûne, bi buhayê **108 hezar û 500 Euro** pêlavên taybet, derman û alavên protezê hatin şandin.

Di çarçoveya biryara ku di Konferansa ji nû ve avakirina Kobanê ya navneteweyî de, Heyva Sor a Kurdistanê ji bo avakirina nexweşxaneyekê **500.000 Euro** şand Kobanê.

Bi buhayê **84.000 Euro** ji bo Kantona Cizîrê û herêma Şengalê 2 wesayîten cemedê û ji bo Kantona Cizîrê Kemyonek û ji bo Kantona Kobanê cîhazeke Fîzyoterapî hatin şandin.

Her weha bi birîndarên şer yê li Başûr û Bakur û derfetên wan yê dermankirinê tine ye alîkariya **5.000 Euro** hat kirin.



Ji bo dever û herêmên ji berşer û êrîşan wêran bûne, proje ya alîkariya lezgîn.

Di çarçove ya vê projeya me de sala 2015'an alîkariya bi buhayê **45.000 Euro** hate kirin.



Projeya alîkariya ji bo zarokên muhtac yên li Kurdistan û Tirkîyê



Li Bakur, Başûr û Rojavayê Kurdistanê pêwîstiyên 1000 zarokê hatin bicih anîn. Her weha ji bo zarokên panaber yên li dibistana Duhokê bi buhayê **10.000 Euro** alîkarî hat şandin.

Projeya belavkirina alîkariyên Fitre, Zekat û Qurbanê.

Heyva Sor a Kurdistanê bi munasebeta boneya meha Remezanê **100.000 Euro** (30 mîlyon Lîreyên Sûrî) alîkarî ya madî ji şêniyên taxa Şêxmeqsûd li Bajarê Helebê re şand. Alîkarî ji aliyê Heyva Sor a Kurd ve hatin wergirtin û li şêniyên taxa Şêxmeqsûd hatin belavkirin.

Şêniyên taxa Şêxmeqsûd ji hemû pêkhateyan kêfxweşiya xwe anîn ziman û spasiya Heyva Sor a Kurdistanê kirin.



Heyva Sor a Kurdistanê û Civaka Îslamî ya Kurdistanê, bi boneya Cejna Qurbanê bi buhayê **360.000 Euro** ango 160 mîlyonên Sûrî qurbanê li Kobanê, Girê Spî, Hesekê, Til Temir, Çiyayê Şengalê û wargehên Newroz û Roj yê li herêma Dêrikê hatin belavkirin.



Alîkariyên Cejna Qurbanê hatin berhevkirin, ji aliyê xebatkarên Heyva Sor a Kurd, Şandeya Heyva Sor a Kurdistanê û endamê Civaka Îslamî a Kurdistanê li gel hat belavkirin



Bi deh hezaran welatîyên Kurd û Ereb yê sîd ji alîkariya Qurbanê wergirtin, malavahiya Heyva Sor a Kurdistanê û Civaka Îslamî ya Kurdistanê kirin..



Rêveberên Meclisa Êzdiyan li Çiyayê Şengalê jî anî ziman ku serê 2 salan e Heyva Sor a Kurdistanê xwedî li wan derdikeve û hemû derfetên xwe ji bo Kurdên Êzdî seferber kiriye.



Projeya alîkariya bi Însiyatîfa Dayîkên Aştiyê ya li Kurdistan û Tirkîyê

Bi salane ji bo Însiyatîfa Dayîkên Aştiyê ya li Kurdistan û Tirkîyê projeya me ya alîkariya ji bo xebatên aştiyane û bidawîkirina êş kederan dewam dike.. Di çarçoveya vê projeyê de, sala 2015'an **7.920 Euro** alîkarî hat şandin.



Projeya alîkariya ji bo girtiyên nexweş yê di zindanên dewleta Tirk de

Heyva Sor a Kurdistanê ji bo girtiyên di zindanên Tirkîyê de ku rewşa wan ya tendirustiyê giran e û derfetên wan yê dermankirinê tine ne alîkariyê dişîne.

Li gorî vê, sala 2015'an alîkariya **5.160 Euro** ji bo girtiyên nexweş hat şandin.



Projeya bi cihanîna pêdiviyên jiyanî yên xelkên Rojava û Şengalê



Tevî hemû astengiyên dewleta Tirk jî, ji bo Rojava û Kurdên Êzdî yên li Çiyayê Şengalê bi buhayê **120.000 Euro** 15 TIR tije xwarin hat şandin.



Li Kobanê jî, piştî vegera welatiyan, bi buhayê **268.070 Euro** 10 hezar pakêtin xwarinê hatin belavkirin.



Li Kantona Efrînê jî, li hemberî siyasetên ambargo û dorpêçkirinê, Heyva Sor a Kurdistanê bi buhayê **200.000 Euro** 8 hezar û 40 pakêtên xwarinê ku her yek ji wan 35 kîlo ye, li malbatên xizan û muhtac hat belavkirin.



Wek tê zanîn Newroz 2015'an li bajarê Rojavayê Kurdistanê Hesekê rêxistina Daiş'ê êrîşên xwekuj pêk anîn û di encamê de 54 kesan jiyana xwe ji dest dan û bi dehan kes jî birîndar bûn. Heyva Sor a Kurdistanê **100.000 Euro** angû 32 mîlyonên Sûrî li 200 malbatên qurbaniyên komkujiya Hesekê belav kir.



Ji bo penaberên Kobanî yê li Meletî û Pirsûsê ku xwestin vegeerên cih û warên xwe, Heyva Sor a Kurdistanê alîkariya **30.000 Euro** şand.



Dawiya sala 2015'an Heyva Sor a Kurdistanê 3 TIR tije derman, pakêtên xwarinê, alavên paqijiyê, cil û ber û pêlav ji bo şênîyên Kantona Cizîrê û Çiyayê Şengalê re şand. Alîkariyên di deriyê Sînor yê Sêmkalka re derbasî bajarê Dêrik bûn, radestî rayedarên saziya Heyva Sor a Kurd li Rojava hatin kirin.



Heyva Sor a Kurdistanê, 6 Hezîrana 2015'an li bajarê Elmanya yê Kolnê kongreya xwe ya 23'an li dar xist.



Heyva Sor a Kurdistanê 6'ê Hezîranê li bajarê Almanyayê Kolnê kongreya xwe ya 23'mîn lidar xist..

Mijara sereke ya kongrê, zêdekirina alîkariya bi gelê Rojavayê Kurdistanê û Kurdên Êzdî yên Şengalê bû.

Li gorî vê biryar hat dayîn ku sala 2016'an Heyva Sor a Kurdistanê hemû derfetên xwe ji bo bicihanîna pêwîstiyên Rojava û Şengalê seferber bike. Di Kongrê de Dr Rojvan Bilgin, Amîra Osso, Vahdettîn Kiliç, Suat Yalçın û Çekdar Uruç weke endamên rêveberiya Heyva Sora Kurdistanê hatin destnîşankirin..

Her weha Dr. Rojvan Bilgin jî weke serokên ûyê Heyva Sor a Kurdistanê hat hilbijartin



Sala 2015 'an sazî rêxistin û komeleyên ku piştgiri dan kampanya alikariyê ya Kobanê û Şengalê

1. Xêrxwazên Kurd li Ewropa
2. Saziya Heyva Sor a Kurdistanê li Fransa
3. Saziya Heyva Sor a Kurdistanê li Swîsre
4. Saziya Heyva Sor a Kurdistanê li Swêdê
5. Saziya Heyva Sor a Kurdistanê li Îngilîstanê
6. Saziya Heyva Sor a Kurdistanê li Holanda
7. Saziya Heyva Sor a Kurdistanê li Belçîka
8. Saziya Heyva Sor a Kurdistanê li Norvêcê
9. Saziya Heyva Sor a Kurdistanê li Îtalya
10. Komeleya Alîkariyê a Roja Mezopotamya li Danmark
11. Saziya Roja Sor a Kurdistanê li Awusturya
12. Federasyona Ezdî - FEK
13. Civaka Îslamî a Kurdistanê - CÎK
14. Komeleya Piştgiriya ya welatîyên Agirî li Hanau
15. Xêrxwazên Kurd li Kanada
16. Komeleya Welatîyen-Gogan li Offenbach
17. Cemiyeta ji nûve însakirina Dersîmê
18. Komeleya Kurmeşîyan
19. Federasyona Komeleyên Dêrsimê Li Ewrûpa
20. Seke Sor
21. Karsazên Kurd

